Utlendingsdirektoratet
Norwegian Directorate
of Immigration

# Alîkariya diravî ji bo kesên ku li navendeke pêşwaziya penaberan dijîn

Informasjonsskriv til beboere i asylmottak om stønad – kurmanji versjon

# Innhold


Alîkariya diravî ji bo kesên ku li navendeke pêşwaziya penaberan dijîn ... 3

Mafê te heye ku tu pereyan weku alîkarî bistînî ... 3

Dibe ku mafê te hebe ku tu alîkariyê ji boyî mesrefên bêtir bistînî ... 3

Mesref ji aliyê kempa penaberan ve tê dayîn bêyî ku tu pêşî telebê bidî ... 3

Divê tu daxwaznameyê (telebê) radest bikî da ku mesref were dayin ... 4

Resmên bikarhêner ... 4

Tu dikarî pêşwext pereyan werbigrî ... 4

Qaide ... 5

## Alîkariya diravî ji bo kesên ku li navendeke pêşwaziya penaberan dijîn

Tu yê ku li navendeke pêşwaziya penaberan (kempa penaberan) dijî dikarî alîkariya aborî bistînî.

Di vê nivîsê de, tê agahdariyan bistînî li ser ka kîjan mesref ji mafê te ye ku ji hêla Midûriyeta Koçberiyê ya Norwêcê (UDI) ve bên dayin. Kesên ku li kempa penaberan dixebitin dikarin bêtir agahdariyan bidin te, û eger pirsên te hebin ew dikarin alîkariya te bikin.

### Mafê te heye ku tu pereyan weku alîkarî bistînî

Tu mehê du caran meblexek pere distînî (alîkariya bingehîn). Tu pereyan şindî yan jî li ser kertê distînî. Ev pere, lazime têra mesrefên te yên herî bingehîn bikin.

Tu çiqas pere weku alîkariya diravî a bingehîn distînî girêdayî ye bi

• texlîtê navenda pêşwaziya penaberan a ku tu lê dijî:

  o eger tu li kempeke penaberan ya ku xwarinê nade penaberan bijî, tê ji yên ku li kempeke ku xwarinê pêşkêş dike zêdetir pereyan bistînî.

  o eger tu li kempeke transît an li cîhekî vehewandina acîl bijî, tê ji yên ku di kempeke penaberan a asayî de dijîn kêmtir pereyan bistînî.

  o Li Navenda Gihîştina Penaberan a Niştimanî (Nasjonalt ankomstsenter) wê tu pereyan nedin te, lê eger hewce bike tê xwarinê, tiştên paqijiyê, nivîn û cilan bigrî.

• ka gelo tu bi tenê yî an bi malbata xwe re yî, û temenê zarokên.

• rewşa doza penaberiya te ve

  o eger daxwaznameya (teleba) te a penaberiyê hatibe refzkirin an jî eger desthilatdar red bikin ku bi objêktîvî li daxwaznameya te binêrin, û ji ber vê yekê tu neçarî ku ji Norwêcê derkevî, tê kêmtir pereyan bistînî.

• ka gelo te pere yan tiştên bi nirx hene. Eger milk, mal û hatina te a diravî hebe, divê tu ji karmendê kempa penaberan re bêjî.

### Dibe ku mafê te hebe ku tu alîkariyê ji boyî mesrefên bêtir bistînî

Gereke ku alîkariya diravî a bingehîn têra mesrefên te yên herî bingehîn bike, lê tevî vê mafê te heye ku tu daxwaza alîkariyê ji boyî mesrefên din jî bikî. Ji vê re alîkariya diravî a zêde (izafî) tê gotin.

Tu dikarî bi du awayên cûda alîkariya zêde bistînî:

1. Mesref ji aliyê kempa penaberan ve tê dayîn bêyî ku tu pêşî daxwaznameyê (telebê) bidî. Bi kesên ku li kempê dixebitin re bipeyive li ser hewcedariya te bi alîkariya diravî ji boyî dayina mesrefê.

2. Divê tu telebekê pêşkêşî UDI bikî da û daxwaza dayina mesrefê bikî. Kempa penaberan ya ku tu lê dijî wê alîkariya te bike tu telebê pêşkêşî UDI bikî. Pêdivî ye ku tu li bendê bimînî heya ku tu bersivê bistînî da ku tu zanibî ka UDI wê mesrefê bide yan na.

### Mesref ji aliyê kempa penaberan ve tê dayîn bêyî ku tu pêşî telebê bidî

Her kesê ku li kempeke penaberan dijî mafê wî heye ku ev mesrefên wî yên jêrîn bêne dayin:

- mesrefa çûyina derûnnas (psîkolog), psîkiyatrîst (textorê nefsî) û fîzyoterapî dema ku ew beşek ji dermankirina derûnî (nefsî) be. Derman û transporta (neql) pêwîst a girêdayî dermankirinê jî tê dayin.
- alav ji bo zarokên ku dest bi bexçeyê zarokan an dibistana seretayî dikin, heta rêjeyeke diyarkirî.
- mesrefên di dema jidayikbûnê de heta rêjeyeke diyarkirî, ger mafê te tune be ku tu alîkariya diravî a carekê (engangsstønad) bistînî[1]

Tu yê ku li navenda gihîştina penaberan, kempa transît an jî li cîhekî vehewaindinê yê acil dijî, alîkariyê distînî ji boyî van mesrefan:

- mesrefên tenduristiyê (saxiyê) yên pêwist wekî dermanên bi reçete, serdanên textoran an nexweşxaneyê
- tedawiya diranan a acil
- transporta ku girêdayî ye bi lênêrîna tenduristiyê ya pêwîst ve
- berçavkên xwendinê

Eger tu li kempa entegrasyonê bijî, wê ev mesref jî were dayin:

- mesrefa ji bo kerta mehane a transporta (neql) giştî ji bo beşdarbûna tevdîrên entegrasyonê

## Divê tu daxwaznameyê (telebê) radest bikî da ku mesref were dayin

Tu yê ku li kempeke penaberan ya asayî dijî, divê tu dazwaza dayina van mesrefan bikî:

- xizmetên tenduristiyê
- dermanên bi reçete
- ilaca diranan

Her kesê ku li kempa penaberiyê dijî, dikare daxwaza dayina van mesrefan bike:

- fehsa dîtinê û berçavk li cem optîsyen (pispore berçavkan), an alavên din ên ku tu hewceyî wanî da ku di jiyana rojane de debara xwe bikî.
- tedawiya diranan ya pêwîst.
- transporta pêwîst.
- cil û alavên zêde egger zêdeyî hewcehiya asayî hewceyî hebe
- ji bo qerebûkirina tiştên ku hatine wendakirin di dema çêbûna şewatê an bûyerên din de li kempa penaberan.
- alavên pêwist ji bo perwerdehiyê li dibistana amadeyî, zanîngehê an peymangehê.
- mesrefên bidestxistina belgeyên nasnameyî eger tu xwediyê destûra rûniştinê ya bisînor bî ji ber gumanên li ser nasnameya te.
- veşartina kesên mirî.

## Resmên bikarhêner

Di dema ku tu têde li navendeke pêşwaziya penaberan ya asayî dijî, divê tu bi xwe di nava salekê de pereyekî diyarkirî bidî berî ku tu heq bikî mesrefên lênêrîna tenduristiyê, ilaca diranan û alavên pêwîst ên wek berçavkan wergirî. Ji vê re sînorê miqdar/meblex tê gotin.

Ger daxwaznameya penaberiyê a te hatibe refzkirin an were red kirin ku li daxwaznameya te bi rengekî objêktîvî were nêrîn, dê sînorê miqdar ji te re tune be.

## Tu dikarî pêşwext pereyan werbigrî

Heger hewcedariya te bi alîkariyê hebe ji bo dayina mesrefên ku divê tu ji bo wan telebê pêşkêş bikî, berî ku tu bigihî sînorê resmê bikarhêner, tu dikarî telebekê bidî da ku tu beşekî

[1] Zagona destberkirina civaki § 14-17.

diravan pêşwext werbigirî (silfe li ser alîkariya diravî a bingehîn). Ji alîkariya diravî a ku dê werê û pêde, tê pereyên kêmtir bistînî (alîkariya diravî a bingehîn wê kêmtir be). Bi vî rengî, tê silfeya ku te standiye bi şûnde didî.

Her weha Tu dikarî serî lê bidî da ku tu hinek pere weku silfe bistînî, eger tu mehtêcî alîkariyê bî ji bo kirîna tiştekî an jî dayina mesrefên din ên girîng ji bilî tiştê ku di vê nameyê de hatine behskirin.

## Qaide

Mafên wergirtina pereyan di dema ku tu li kempa penaberan dijî, û erkên ku te hene, di rêziknameyên li ser alîkariyên ji bo rûniştvanên kempa penaberan de hatine destnîşankirin. Tu dikarî rêziknameyê liser www.udiregelverk.no  bibînî. Li vir tê her wusa UDI 2024-002-V1 jî bibînî, ku destnîşan dike ka rêjeyên alîkariya diravî a bingehîn kîjan in.